Kerîm Perwîzî

“Rejîmê li hember şeytanê mezin, serî tewand, û eşkere bû ku diruşmên Weliyê Feqîh çiqas rast in!”.

•••» 5

Kerîm Qelatî

“Rojên herî xweş ew bûn ku Dr. Qasimlo hêj şehîd nebibû”.

•••» 8

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

AGIRÎ

Rêzdar- Hevserokên Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP)

Di gel rêz û silavan!

Em bi vê serkevtina partiya we kêfxweş bûn, ku we di pêşbaziyên hilbijartina şaredariyên Kurdistana Bakûr de bi dest xist. Em hêvîdar in ku ew serkevtina we alîkar be ji bo aştiyeke yekcarî li welatê Turkiyê, di navbera hemû pêkhateyên wî welatî û bi taybetî xûşk û birayên me di vê...

Dom R: 2

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (227) 05-04-2014 Buha (150) Tûmen

Şehîd Namirin

Rêûresma 10’ê Xakelêwe, di binkeya Deftera Siyasî ya PDKÎ de birêve çû.

Roja 30’ê Adara 2014’an (10’ê Xakelêwe) rêûresma roja “Şehîdên Kurdistanê” bi amadebûna sekreterê giştî yê PDKÎ, endamên rêberî, û malbat û pêşmergên PDK Îranê, li baregeha Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, birêve çû.

Dom R: 2

Sergotar

Şehîdên Kurdistanê

Şehab Xalidî

Herçend ku PDKÎ roja 10'ê Xakelêweyê, rast roja bidarvekirina pêşewa Qazîmihemed wekî roja şehîdên Kurdistanê diyarî kiriye, û di vê rojê de, rêz ji ked û tekoşîna bi salan ya wan pêşmergeyan girtî ye ku canê xwe di riya armancên hizb û gel de gorî kirine, lê PDKÎ li ser vê baweriyê ye ku Pêşewa Qazîmihemed ne tenê avakerekî PDKÎ bûye, belkû ew serok û serkirdeyekî neteweyî bûye, ku azadî û rizgariya neteweya Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê hêvî û xweziyên wî rêberê leheng bûne.

Lewra wî di vê qonaxa hestiyar de, û di demekê ku dikarî xwe ji mirinê jî rizgar bike, xelkê xwe bi tenê nehêla û jiyan û riha xwe kire goriyê armancên buhagiran ên gelê xwe. Lewra ew wekî yekemîn serkomarê Kurd li Kurdistanê, ku xwe kiriye qurbaniyê neteweya xwe, hêjayî rêzgirtineke bê sînor e.

Bê guman diyarîkirina roja şehîdkirina wî wekî roja şehîdên her çar parên Kurdistanê, dikare hurmetgirtineke baş ji wî û hemû şehîdên riya rizgariya Kurd û Kurdistanê be. Ew rêberê ku di wê serdemê de, ew qas demokrat, xelkî, neteweyî û mirovdost be, bi bê berçavgirtina berjewendiyên takekesî, yan hizbî, ew rêberekî bê hempa li gorî dema xwe ye.

Hewce ye ku hemû hêz û aliyên siyasî, rêzgirtina ji şehîdên xwe, tenê di çarçoveyeke teng ya hizbî de nehêlin, jiber ku şehîd û rûmeta wan gellek ji vê yekê meztir e ku sînor jêre bihên danîn. Bi hêviya vê ku rojekê em şahidê yek helwestiya hemû hêz û aliyên siyasî ên Kurd li ser diyarîkirina roja şehîdkirina Pêşewayê Kurd Qazîmihemed wekî roja şehîdên Kurdistanê bin. Herwisa di vê rojê de hemû bi hevre şehîdên xwe yên cangorî bi bîr bînin, û di vê rojê de, di gel malbatên wan peymana domandina riya wan ya pîroz nû bikin. Jiber ku xelata herî baş bo şehîdan domandina riya wan e.

Civîna Mistefa Hicrî tevî malbatên şehîdan

Roj Yekşemî 30'ê Adar a 2014'an (10'ê Xakelêweya 1393), Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ ligel hejmarek ji malbatên şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê kom bû.

Hicrî di vê civînê de keyfxweşiya xwe ji dîtina malbatên şehîdan eyan kir, û li ser rewşa niha ya Kurdistanê û nêzîkbûna rizgariya yekcariya gelê me di vê para Kurdistanê de axavtin kir û got: "Dibe em hemû rojekê weke roja şehîdan bizanin, çimkî tu rojekê salê nebûye ku xortên xebatkarên Kurd xwîna xwe li ser axa kurdistanê nerêjandibin, û eva jî me tîne ser vê bawerê ku heya gehîştin bi armancên şehîdên xwe, em dirêjederê rêya wan bin.

Sekreterê giştî yê PDKÎ got: "Rizgarbûna beşek ji Kurdistanê û bidestvehatina mafê Kurdan li çendîn parên din ên Kuridstanê û dilxweşiya wan hevwelatiyên kurd li wan cihan ku bi mefên xwe şad bûne, cihê dilxweşiyê bo piraniya neteweya kurd û bixasmanî kurdên rojhelatê ye".

Herwiha Mistefa Hicrî eva jî got: "Di beşa din a Kurdistanê de ku rejîma Îslamî ya Îranê deshilatdariya wî bi ser de zal e, gelê Kurd hêşta tepeser dike û niha bi tund kirina givaşan bo ser hemwelatiyan û çalakvanan, tirsa xwe ji hilweşanê derdixe".



Birêz Mistefa Hicrî

Doma R: 1

Beşa yekemîn a rêûresmê bi rêjeya leşkerî ya hêza pêşmergeyên Kurdistanê bo ser cimata şehîdan dest pê kir, û li ser goristana şehîdan du sirûd bi navên "Şehîdan" û "Merêjin bom firmêskî xem" ji aliyê hêza pêşmerge ve hat xwendin, û piştre rêzdar Mistefa Hicrî li gel Zeyneb Pêrewan xwîşka şehîd "Îzet Pêrewan" qevdeke gulan li ser gora şehîdan danîn.

Piştre pêşangeha nîgarên şehîdên PDK Îranê ji aliyê Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ û xanima Wilê Celalî xwîşka şehîd Setar Celalî ve hat vekirin.

Di beşa duyem a rê û resmê de ku li hola merasimên PDK Îranê de birêve çû, di destpêkê de sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" hate xwandin û piştre çend deqeyek bêdengî bo rêzgirtina ji canê paqij ên şehîdên Kurdistanê hat ragehandin.

Paşan peyama komîsiyona Komelayetî ji aliyê Tahir Mehmûdî Endamê Komîteya Nawendî ya PDK Îranê ve hat pêşkeşkirin.
Piştre sirûdeke şoreşgerane ji aliyê kora mûzîkê ya PDKÎ ve hat xwendin, û di dirêjahiyê de, peyama hevbeş a rêxistinên Ciwanan, Jinan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê Şemal Terxîbî endamê heyeta birêveberiya yekîtiya Xwendekaran ve hat xwendin.

Di dirêjahiya rêûresmê de peyama Partiya Şiyoî ya Kurdistanê ji aliyê Ebû Tara endamê Mekteba Siyasî ya vê partiyê ve hat pêşkeşkirin. Herwisa pexşanek ji aliyê Ehmed Şêrbegî ve ku taybet bo rêûresmê hatibû şandin, hate pêşkeşkirin.

Paşan sirûdeke din a şoreşgerane bi navê "Xwîna Xakelêwe" ji aliyê Xolam Fatihî û bi alîkariya kora mûzîka PDKÎ ve hat xwandin û paşan pexşanek bi navê "Hestanewe" ji aliyê "Dilniya Pîrî" keça şehîd "Cemşîd Pîrî" ve pêşkeşî amadebûyiyên rêûresmê hat kirin.

Herwisa hejmarek peyam bi destê rêveberiya rêûresmê gihîştibûn ku navên wan bi vî awayî ye: Partiya Şiyoî a Kurdistanê, komîta qezaya Koyê
Partiya Demokrat a Kurdistanê, lêjneya devera Koyê
Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê

Hêjayî basê ye ku deqa peyama Komîsyona Civakî a PDKÎ bi boneya 10'ê Xakelêwe, di rûpelên sê û çar de hatiye bilavkirin.

Doma peyama PDKÎ bo BDP

para Kurdistanê de. Bi vê boneyê ve, li ser navê Mekteba Siyasî ya partiya xwe, em pîrozbahiyên herî germ li we dikin, û ji riya we ve jî, pîrozbahiyên xwe ji bo hemû berbijarên serkevtî û bi giştî partiya we dişînin. Em hêvî dikin ku hûn di riya xizmetkirina bi gel û welat de serkevtî bin.

PDKÎ
Deftera Siyasî
01.04.2014 (12.01.1393)

Deqa peyama Komîsyona Civakî a PDKÎ bi boneya roja 10’ê Xakelêwe

Tahir Mehmûdî berpirsê Komîsyona Civakî: “PDKÎ tu carî neçemiya û pişta xwe li jêr barê vê xema giran de rast kir”.

Xelkê tekoşer ên Kurdistanê!
Malbatên şerbilind ên şehîdan!
Mêhvanên rêzdar!

Endamên rêzdar ên rêberatiya PDKÎ û kadr û pêşmergeyên hêja!

Îro roja 10’ê Xakelêwe, roja şehîdên Kurdistanê ye. Lewra em li vir li dewra hev kom bûne, da ku rêz ji şehîdên Kurdistanê bigrin, û yad û bîra Pêşewa Qazîmihemed û hevalên wî û hemû şehîdên Kurdisanê ku jiyana xebatkarane û mirina serfirazane ya wan bûye mînak û sembola hemû xortên Kurdistanê, bo xebat û berxwedana di riya azadiyê de, em bilind dinirxînin.

67 salan berî niha û di roja 10’ê Xakelêwe, pêşewayê mezin serkomarê Kurdistanê û Heme Husênxanê Seyfê Qazî, û Ebûlqasımê Sedrê Qazî li qada Çarçeraya Mehabadê û rast li vê cihê ku salekê pêştir Komara Kurdistanê li wir hate ragehandin, li ser biryara Heme Riza Şah hate bidarvekirin.

Rejîma Paşatiyê ya dîktator, jêve bû ku bi nemana Komara Kurdistanê û bidarvekirina serkomarê Kurdistanê û hevalên wî, tevgera rizgarîxwaziya Kurd, bo her tim dikeve qedema û hesta Kurdatiyê û bîra neteweyî, di dil û mêjiyê xelkê kurdistanê de namîne. Lê vê karesatê ne tenê her nekarî ku îradeya xebat û berberekaniya neteweya Kurd têk bişkêne, belkû kûreya xebat ji bo azadî û rizgariya Kurdistanê germ kir.

Yek ji wan waneyên mezin û giring ku Pêşewayê me yê mezin ji me re bi cih hêlaye, û dibe em berdwam jê hîn bin, û şanaziyê pê bikin, xweragiriya Pêşewa û berevaniya ji mafê rewa yê Kurd li hemberî celadên rejîma paşatiyê û dadgeha leşkerî ya vê rejîmê û mezinahiya Pêşewa di astekê de bû ku serbarê vê ku navbirî wekî bendkirî di bêdadgeha wê rejîmê de bû, lê eva Pêşewa bû, ku rejîm bi tewahî dadgehî kir, û bi hemû baweriya xwe ve bergirî ji armancên Kurd kir.

Eva jî vê rastiyê diselimîne ku Pêşewa gellek baş dizanî ku mafê wî yê rewa ye ku wekî hemû mirovekî li ser vê cîhanê, azadane xak û av û wargeh û nîştimaneke wî hebe, û yên ku dixwestin wî dadgehî bikin ji bilî dagîrker naveke wan ê din nîne, û tu mafeke wan li ser Kurd û Kurdistanê nine.

Her ew baweriya qahîm ya Pêşewayê mezin Qazîmihemed bû ku îzin neda ku di dema bidarvekirinê de, çavên wî girê bidin, û biryar da ku di demên dawî ên jiyana xwe de, çavên wî li vî xaka pîroz û xortên neteweya xwe be, ku bi dil û can ve, fîdakarî jêre kir.

Raste ku Komara Kurdistanê nemaye, lê armancên Komara Kurdistanê her wa armancên xelkê Kurdistanê ne. Xelkê Kurd di Kurdistana Îranê de, her li ser vê rêbazê ne ku Pêşewa û bi hezaran şehîdên Kurdistanê bi pêşkêşkirina canê xwe xemilandine, wateriya azadî û rizgariya gelê Kurd.

Hemwelatiyên birêz!

Felsefeya hebûna Komarê bi rêberatiya Pêşewa nîşaneya dûrbîniya wî kesayetiyê, û qalbûna wî ya di nava xebata neteweyî û pirsa nasyonalîzmê de bû. Pêşewa di nava sir û seqem hizra wê serdemê de, karî pirseke giring wekî nasyonalîzmê bi awayekî serdemiyane zeq bike û hejmarek ji binemayên nasyonalîzmê bihêz bike.

Pêşewayê Kurdan bi kar û kiryara xwe, xwest ku bêje nivşa pêşiya xwe, ku formgirtina nasyonalîzmê û cihgirbûna wê hewcedarê qurbanîdanê ye, û baş ji vê rastiyê tê gihîştibû ku ziman bo seqamgîriya nasyonalîzmê gellek giring e, lewra beşeke zaf ji hêza Komarê di vê riyê de bi kar anî, û dixwest ku pirsa kultura gîştî ya Kurd bike bingeha karê dîplomasiyê.

Ew çend xal nîşander û selmînerê vê yekê ne ku binemayên nasyonalîzma Kurdî, zêdetir ji nîv sedsalî berî niha form girtiye. Berevajiyê gotinên hinek ji qelembidestan ku bangeşeya “Qewmiyet”ê dikin. Lewra li ser neteweya Kurd û partiya Pêşewa hewce ye ku bingehên nasyonalîzma Kurd bi piştqahîmiya bi teoriyên cîhanî, bihêz bike, û pirsa “Çiyetî” û “kîyetî” di nasyonalîzmê de zeq bike, û navber û cudahiyan destnîşan bike.

Xûşk û birayên rêzdar!

Pêşewa Qazî bi nirxandina rewşa ku di encama şerê duyemîn ê cîhanî de çê bibû, û bi mifahwergtina ji pêgeh û bandora civakî ya xwe, karî û partiyeke modern bo rêbertiya xebata neteweyî ya Kurd ava bike, û di gel bûyeran here pêş û dewleta Komara kurdistanê ragehîne û serweriya siyasî û mafê xwebirêvebirinê ji Kurdan re desteber bike.

Ew kiryara mezin ya Pêşewa û partiya wî, guhertineke bingehîn li rewşa siyasî ya civakê de bû, lewra Komara Kurdistanê û Pêşewa Qazî bûne kelema çavên kevnarperwerên Tehranê.

Wê demê jî ku Komara Kurdistanê kete metersiyê de, bi emegdariya bi sond û peymana ku di gel neteweya xwe girê dabû, amade bû ku bi gorîkirina canê xwe berevanî ji xak û xelkê nîştimana xwe bike.

Hewce ye ku wekî rêzgirtin û emeg-

dariyekê em yad û bîra qehremanên Barzanî bikin ku di dema Komara Kurdistanê de gellek fedakarî kirin, û li şerê Mameş û çendîn bergiriyên cesûrane de, bi hemû hêz û şiyana xwe bergiriyê ji Komara Kurdistanê bikin û şehîdbûna fermandeyê naskirî "Xoşewî Xelîl" vê rastiyê diselimîne.

Di gel şehîdbûna Pêşewa û hiloşîna Komarê, partiya me derbeke bi bandor lê ket, lê belê neçemiya û pişta xwe li jêr barê vê xema giran de rast kir, û xebatkarên partiya me karîn piştî heyamekê bi tekoşîn û fedakariya xwe, dilê dostan şad bikin û dijminan jî perîşan û bêçare bikin. Berxwedana têkoşerên PDKÎ di nav girtîgehên rejîmê de, derbiderî û awarebûn û di encam de serhildana 46-47'an (1967-68) lê ket, ku di vê qonaxê de jî, desteyek ji kadrên herî baş ên PDKÎ, canê xwe goriyê armancên pîroz ên PDKÎ kirin.

Malbatên serbilind ê Şehîdan!

Piştî şoreşa gelên Îranê û destbiserdegirtina zehmet û mandîbûna gelên Îranê ji aliyê taqimeke oportonîst ve, qonaxeke din ji xweragiriya tekoşerên demokrat dest pê kir, kîjan çiya û kîjan gund û bajar di vê Kurdistanê de heye, ku qada şêre kurên Demokrat nebe, û dastana berxwedan û serînetewandinê têde nehatibe nivîsandin.

Di gel berfirehbûna qada şerê dasepayî, rêberê mezin Dr. Qasimlo bi armanca amadekariya zêdetir û lêxistina derbên giran li dijmin, daxwaza alîkariyê ji YNK (Yekîtiya Nîştimaniya Kurdistanê) kir, li jêr navê hêza piştîvan wekî pişt û penaya PDKÎ, da ku alîkariya PDKÎ bike.

Di helwesteke bi cî û neteweî de, wan bersiva daxwaza PDKÎ dan, û bi bextkirina canê 15 kes ji fermande û pêşmergên xwe, û birîndarbûna bi dehan kesên din rûpelekî zêrîn di dîrokê de bi cih kirin. Hewceyê îşarepêkirinê ye ku tekoşerên partiya Şiyoî, û partiya Sosyalîst bi bextkirina canê baştirîn kadr û pêşmergên xwe, erkeke bilind ya neteweyî encam dan, û hejmarek ji baştirîn kadrên wan şehîd ketin û di vî warî de çi ji dest wan hat, bo xizmetkirina bi şoreşê encam dan.

Em bi erka li ser milê xwe dizanin ku rêz ji tekoşerên Turkiyê û bi atybetî zehmet û mandîbûna hevalên partiya Sosyalîst a Kurdistanê-bakûr bigrin, ku bi kiryar di qada xebata rewa ya neteweya me de, ji tu fedakariyekê xemsarî nekirin.

Amadebûyiyên hêja!

Di nava neteweyên din ên Îranê de jî, xortên neteweya Turkên Azerbaycanî, hejmarek ji têkoşerên xwe pêşkêşî baregeha azadiyê kirine û bi rêbaza PDKÎ emegdar man, ku di nava wan de xebatkarê heta ser emegdar, Muhendis Riza Xeyatî tê dîtin. Xebatkarên neteweya Belûç bi dilsozî û zehmet û mandîbûna xwe mil bi milê pêşmergeyên PDKÎ dilsozane xizmet bi tevgera rizgarîxwaziyê û PDKÎ kirine.

Dema ku em bas ji rola şehîdên PDKÎ dikin, em nikarin fedakariya hemû hêz û aliyên siyasî ên Kurdistana Îranê li qada xebatê de ji bîr bikin ku bi fedakariya xwe di bendîxaneyan de, û bi serşorkirina celadên rejîmê, û bextkirina canê pêşmergên xwe, rola xwe ya hêja di warê xizmet bi mafên rewa ên kurdistanê de lîstine.

Dema em avriyekê li dîroka pir ji serweriya partiya xwe didin, em dibînin ku di vê rêyê de bi sedan asteng û berbestên neyarên xwe derbas kiriye û di vê pêxemê de canê bi hezaran kes ji xebatkarên herî baş ên xwe gorî axa Kurdistanê kiriye, lê bo bîstekê jî, dest ji xwastekên xwe ên rewa hilnegirtiye, û piştqehîm bi civatên xelkê Kurdistanê bûye, û bi îman û bawerî bi rêbaza şehîdan, li ser xebatê berdewam bûye, û heya gehîştin bi rizgariya herdemî û bidestxistina mafên netewî, xebat û tekoşîn berdewam dike.

Komara Îslamiya Îranê jî bi hemû şiyana xwe hewla jinavbirin û dijatiya xelkê Kurdistanê û partiya me daye, û be hizra xwe digîje armancên xw ên dijî gelî. Em dibînin ku teror, bidarvekirin û her rêyekî diceribîne, lê hertim tevî şikestê berbirû dibe.

Di çend heyvên derbasbûyî de, karbidestên rejîmê li çend bajarên Kurdistanê serdana malbatên serbilind ên şehîdên PDKÎ kirin, û bi soz û qewlan, daxwaz ji wan kirine ku derheq bi derbazbûyiya şehîdê xwe baxivin û daxwaza lêborînê ji Komarî Îslamî bikin. Mohreyên Îtilaatê haydarî vê yekê nînin ku malbatên şehîdan bi başî dizanin ku ezîzên wan canê xwe di rêya xebat bona azadî û rizgariyê û mafê netewî pêşkêş kirine û tu carî berhev nînin ku serê xwe yê bilind bo rejîmekê bitewînin ku qatilê xortên wan in.

Felsefeya rejîmê her di despêka hatine serkara wê de, li ser dijatiya netewa Kurd hatiye damezirandin.

Lewra xelkê Kurdistan û xebatkarên partiyê, yek bi yekê van şehîdane bi kes û karên xwe dizanin û milkê tenê malbatên wan ninin. Jiber ku di pêxema bexteweriya vî xelkê de canê xwe gorî kirine û xelata herî baş bo cangorîtiya wan, emegnasî û wefadarî bi armancên wan in.

Civakên xwedî şeref ên Kurdistanê!

Her weke heya niha we nîşan daye, we erkê nîştimaniya xwe derheq bi malbatên şehîdan, bi serdana mezarên şehîdan, û wefadarî û emegnasiya xwe bi malbatên şehîdan û bi partiya xwe nîşan daye.

Bi vê helwêsta xwe, we çavê dijminên azadiyê kore kiriye, û dilê yadgarên şehîd û hevçeperên wan şa dikin, û xatircem bin ku roja azadiyê wê derbikeve! Heya cihê ku peywendî bi PDKÎ ve hebe, weke hertim partiya me bi pirensîpên xwe ên negor wate demokrasî, mafê netewî û serbixweyiya siyasî ya biryardanê, li hember xwîna bi neheq rijiyayî ya şehîdan, wefadar û emegnas dimîne, û tu cure zext û rewşek taybetî, nikare pêngavên wê sist û şil bike.

Di 67'mîn salvegera bidarvekirina Pêşewa û hevalên wî de, serbarê şandina silav bo canê paqij ê Pêşewa û tewahiya şehîdên Kurdistanê, em peymana wefadarî bi armancên wan nû dikin, û bi vê hêviyê ne ku heya gehiştin bi azadî û rizgariyê, bi vê soz û peymanê wefadar bimînin.

Silav li yekemîn serkomarê me yê şehîd Qazî Mihemed û tewahiya şehîdên Kurdistanê!
Mirin û neman bo rejîma Komara Îslamî!
PDKÎ
Komisyona Civakî
10.01.1393
30.03.2014

Nerîna Lîderan

Barzanî:

"Em li benda aramî û pêkvejiyanê li Îraqa nû de bûn".



Demîrtaş:

"Emê sozên xwe yên derbarê perwerdeya zimanê dayîkê de bi cih bînin".

Merziye Efxem:

"Biryarnameya mafên mirovan ya li dijî Îranê, ne rewa ye".

Hemîdriza Moqedemfer:

"Emrazên wekî ragehandinên giştî, û wêje dikarin riya herî bi bandor bo nifûza dijmin bin".

"Ji wê rojê şûnde ku Xumeynî ragehand "Komara îslamî" ne peyvek kêm û ne peyvek zêde, heya niha jî hewla ji nû ve darêtina hizr û riftarên xelkê li ser bingeha îdolojiy Wîlayeta Feqîh dide".

Kerîm Perwîzî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ:

Diyarîkirina navê salê bi dirûşmên şewqdar bona xapandina bîrûraya giştî ji aliyê rêberê Komara îslamî ya Îranê ve, di çend salên derbazbûyî de hertim ducarî dibe. "Aborî û çand tevî îradeya netewî û birêveberiya cîhadî" dirûşma îsal ya vê rejîmê ye. Bona bas û nîqaş û şiroveya zêdetir ya vê mijarê, me gotûbêjek tevî birêz Kerîm Perwîzî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ pêk anî, ku deqa vê gotûbêjê bi vî awayî ye:

H: Arif Vêlzî

Pirsyar: Gelo bi baweriya we niha ku sala Hemaseya Siyasî û Aborî bi dawî hatiye, çi pêngavek maye ku rejîma Komara Îslamî di warê aborî de bavêje û dirûşma han çi xizmetekê bi rewşa niha ya aboriya Îranê dike?

Bersiv: Mijar û pirsek girîng di warê nasîn û nasandina rejîma Komara Îslamî, lêhûrbûn ji dirûşmên wê ye, rejîma Komara Îslamî li ser esasa têza bîrokeya Wîlayeta Feqîh berdewam û di hemû waran de dirûşm û bangewazên ecêb hilgirtine û di naveroka xwe de bi tewawî berevajî wan dirûşm û soz û peymanan kar û riftar kiriye.

Di serdema despêka deshilat bidestvegirtinê heta piştre ku şer tevî rejîma Îraqê kir û heya qonaxên paştir û heya niha jî, heya Komara Îslamî dirûşmên şewqdar û mezintir û zehmettir hilgirtibe, di rastî de nîşanderê nebûna şiyan û lewaziya navxweyî a rejîmê bûye. Bi watek din her demekî ku digel arîşe û astengên mezin berbirû bûye, û di kirîzê de dest û pê kutaye, dirûşmên mezintir bilind kiriye.

Di serdema şerê tevî rejîma Îraqê, çaxê ku di eniyên şer de tevî şikistê berbirû dibû û hêzek zaf a mirovî bi xisarî dida, di diruşmên xwe de û bi taybet di nimêjên rojên Înê de, gotarbêjên ser bi rejîmê, bas ji nêzîkbûna bi serkevtinê û herweha şer heya azadkirina Qudsê kiriye.

Ya 2,3 sal berî niha dema ku hisarên navnetewî dijî Komara Îslamî tundtur bûn, hindek ji berpirsyarên rejîmê ragehandin ku dibe em weke dema hisarên ser "Şe'bî Ebî Talib" riftarê bikin.

Îşare bi wan salan dihate kirin ku di despêka dîroka Îslamê de, Misilmanên Mekê di dolekê de bi navê "Şe'bî Ebî Talib" ketin nav hisarên aborî de û heyama çend salan bi hejarî û xwazokî jiyana xwe derbaz dikirin. Lê Xamineyî Rêberê Komara îslamî bi nerihetî ve bas ji vê yekê kir ku ne tenê li rewşa lewaz û hisarê de ninin, belkî di rewşa Bedr û Xêyberê de ne ku serkevtinên mezin di despêka Îalamê de tomar kirine. Lê hemû 2 sal bi ser de derbaz nebûn ku li hember Şeytanê mezin de bi çok de hat û stûyê xwe tevand û eşkere bû ku diruşmên Weliyê Feqîh heya çend rastin.

Sala 2013(1392)'an ji aliyê xamineyî ve weke sala Hemaseya Siyasî û Aborî hate binavkirin, lê hemaseya wê di warê siyasî de ew bû ku mohreyek ewlehî ya xwe bike serkomar da ku tevî Şeytanê mezin lihevhatinekê bidest bixe û hemaseya aborî jî ev bû ku bi lihevhatinekê tevî Rojavayê, bikare 6 Milyard dolar ji pereyên netewî ku pêştir hatibûn biloke kirin azad bike.

Weke din tewahiya dirûşm û soz û peymanên ku di serdema sinaryoya hilbijartinê de dabûn, bi direv derçûn û niha hemû bas ji dewrana dijwar ya aborî dikin û şarezayên aborî jî li ser vê baweriyê ne ku sala 2014(1393)'an, salake pir ji zehmetî û pir ji hejarî û pir ji kirîz dibe bo îranê.

Encama tewahiya siyasetê aborî û çewaşekarî û birêveberiyên rejîmê di warê aborî de, kirîza aborî. Ew qasê bêkarîiyê, hejariya berbilav, daxistina kargehan, nebûna dirav bona birêvebirina armancdarkirina yaraneyan û ...hwd bûye.

Rohanî bi eşkere bas ji wêranbûna rewşa aboriya welat dike. Lewra ev diruşm û navdêrkirin ji aliyê Weliyê Feqîh ve tenê ew qasê kirîz û neçarbûna rêberên rejîmê di warê çareserkirina alozî û arîşeyan nîşan dide.

Pirsyar: Bi liberçavgirtina gendeliya berbilav a di navbera deshilatdarên Komara Îslamî û dam û dezgehên rejîmê de, têgeha "Mudîriyeta Cehadî" dikare çi cih û wateyek hebe?

Bersiv: Eva ku Weliyê Feqîh bas ji Mudîriyeta Cehadî dike, berî her tiştî nîşaneya vê yekê ye ku Weliyê Feqîh rewşa han bi rewşek cîhadî dizane. Rewşa cîhadî di warê aborî de, nîşana ew qasê kirîz û alozî û gefa li ser rejîmê ye û di vê biyavê de rejîm şerê man û nemanê dike. Rewşa cîhadî ev rewşe ku êrîşek berfireh û malvêranker li ser pergalê be û di bereberê vê de be ku pergala rejîmê bi hevre girê bide û biherifîne û rêberê rejîmê fermana cîhadê bona rizgarkirina pergalê daye da ku di demên dawî ên mirin û jinavçûna rejîmê de, bi mudîriyeta cîhadî bigehin hevara rejîmê û biparêzin.

Lê gelo rêberiya rejîmê ev rewayî û meşrû'îyet maye ku biryara cîhadê bide? Gelo berpirsyarên rejîmê kesên dilsoz û cangorî ne ku bigehin hevara sîstemê? Gelo îmkan û derfeta vê yekê hene ku pergala xwe rizgar bikin?

Bersiva tewahiya van pirsyaran wî çaxî eşkere dibe ku avriyekê ji sala derbazbûyî bidin û wan nûçeyan bînin bîra xwe ku gendelî û diziya sedan û hezaran milyardî a berpirsyarên rejîmê eşkere bûn û kesên herî nêzîk ji Xamineyî jî dest têde hebûn û rêberê rejîmê biryar da ku zêde bas jê nehê kirin.

Lê her rojê gendeliyek nû ji wan eşkere dibû, heya kar gehişt vê yekê ku nûçegehaniya Roytêrzê bas ji samana 100 milyard dolarî ya xamineyî dikir. Di pergal û rewşek weha de fermana mudîriyeta cîhadî tenê weke henek tê ber çavan.

Pirsyar: Piştî derbazbûna sê dehikan bi ser şoreşa çandî de, diyarîkirina salekê bi navê çand di

Dom R: 6

Kuştin û reşekujiyê, nekariye hewara mafxwazên kurd bêdeng bike

Dara Natiq

Dujminên gelê kurd bi dirêjahiya dîrokê û bi piraktîzekirina siyaseta asimîlasyonê û bi bernameyên curbicur hewla helandin û jinavbirina neteweya kurda daye, bê tu ferq û cudahiyeke îtnîkî û olî dikirin, heyf û mixabin rêberê wê demê yê rejîmê, bê vê ku guhdariya daxwazên rewa ên xelkê bike, biryara xezayê (cîhadê) li dijî xelkê mafxwazên kurd ragehand û carek din kuştareke bêrehmane li dijî neteweya kurd rê xistin, û bi hezaran kesî ji xelkê bê sûç gorî bûn, û sedan kesên azadîxwaz û têkoşerên neteweya me jî hatin bidarvekirin û komkujî û reşekujiyê sertaserê kurdistanê dagirt, û şereke malxirabker bi ser kurdistanê de hat sepandin, û bajar û bixasmanî gund xirab kirin û bêhurmetî bi mizgeftan kirin, Quran şewitandin û rehim bi jin û zarokên sawa jî nekirin.

Siyaseta komara Îslamî bi merema tepeserkirin û jinavbirina bizava neteweya kurd li kurdistana Îranê û hewlên wê bizavê bo cihgirkirina sîstemek demokratîk û destveanîna mafê çarenivîsê, ji aliyê komara Îslamî ve kete ber lehiya jinavbirin û reşekujiyê.

Piştî serketina şoreşa gelên Îranê û bi talanbirina destkevtên şoreşê ji aliyê komek melayên derefetxwaz û dijî azadî, kurdistan kete rewşek xirab û rewş û hewayeke pirr metirsîdar de.

Rêjîmê êrîşek berfireh li bajar û gundên kurdistanê dest pê kir, û beşek berbiçav ji gundên kurdistanê xirab bûn.

Bixasmanî êrîş bo ser gundê Qelatana Nexede ku li 6'ê xakelêweya 1359 'an (Adara 1980) ku tevî wêrankirinê ,50 kes jî ji xelkê wî gundî şehîd kirin.

Herwisa li roja 7'ê xakelêwe di heman salê de, êrîş kirne ser gundê Çeqel Mistefa li bajarê Nexedê, û 21 kes ji xelkê wî gundî şehîd kirin, û gundê wan jî bi tewahî ji nav birin.

Xirabkirin û kuştina xelkê gundê Gêçê û Pîrancix li herêma Somabiradost li bajarê Urmiyê li 3-4'ê xakelêweya sala 1362 (Adara 1983) ku 33 kes ji xelkê wan du gundan kuştin. Kuştina zêdatir ji 50 hezar kes ji xelkê bê sûç li kurdistanê û xirabkirina dehan gund di kurdistanê de berhema siyasetên şerxwazane û asemîlasyona rêjîmê bû ku vedizanî bi xirabkirin û reşekujiya xelkê kurdistanê, tevgera azadîxwaziya neteweya kurd jinav diçe.

Lê siyaseta çepel û dijî mirovahiyê ya rêjîmê ne tenê nekariye îradeya mafxwazên xelkê kurdistanê lawaz bike û jinav bibe, belkû kurdistan îro bûye qada xebat û berberekaniya dijî siyasetên rejîmê û gelê mafxwaz ê kurd, û herweke berê bi îradeyekê bihêztir,li hemberî bidestveanîna mafên rewa ên xwe de xebatê dikin.

Doma R: 5

Komara Îslamî de çi wateyekê digehîne?

Bersiv: Di wê rojê de ku Xumeynî yê rêberê rejîma Komara Îslamî diruşma azadîxwaziya xelkê guherî û ragehand ku "Komara Îslamî" ne peyvek kêm û ne pevek zêde, heya niha rejîm bi hemû awayekê hewla kontrolkirin û herifandina çandî ya gelên Îranê, û herweha ji nûve darêtina hizr û riftarên xelkê li ser bingeha îdolojiy Wîlayeta Feqîh dide.

Di wê rojê de ku hêriş kirine ser rojname û kovar û medyayan û zanîngeh xistin bin destê xwe û şoreşa çandî ragehandin, hewil dane ku civaka Îranê bikin civakek kevî di bin destê rêberê rejîmê de.

Lê niha jî ji pîlana xwe de serkevtî nebûne û her sal û bi her hêcetekê, basa çand û berxwedana çandî û jinûve darêtina çandî û mijarên han dikin û hêj jî têde mane. Bitaybet ji vê yekê nîgeranin ku êdî xelik guh nede axivtinên berpirsyarên rejîmê û rêyên din bide pêşiya xwe.

Tevî soz û peymanê Rohanî, hindek ji xelkê li ser vê baweriyê bûn ku bi aliyê kêm ve di warê çandî de wê pencereyej ji wan re vebe, lê berî heyvekê Xamineyî oltîmatom da û wezîrê çanda Rohanî jî bersiva erênî jêre da û li vê diruşm û navdêrkirina sala 2014(1393)'an de, cardin îşare bi çand weke aliyek bingehîn û girîng tê kirin ku di wê de jî, bi dîtingehek cîhadî ve diçin pêş û kes nabe tûrikê bo vê yekê bidûre ku pencereyek biçûk a çandî bo bê vekirin.

Pirsyar: Diruşma îsal ya Xamineyî, tevî siyaseta dereve û di peywendî tevî siyaseta "Nermişa Qehremanane", çi peywendiyekheye?

Bersiv: Eva ku rejîm li ser astê derve û li ser asta aborî de bi tewahî lawaz bûye û tevî kirîzên ev qas tund û dirjwar berbirû bûye ku gefa herifînê liser zêdetir kiriye, bo hemû kesekê eşkere ye ku her bi neçarî di van waran de, Xamineyî bi navê Nermişa Qehremanane de serê xwe bi xwastekên Rojava tevand û tevî Şeytanê mezin lihev hatin da ku rejîma xwe ji vê qonaxa dijwar derbaz biket.

Di diyarîkirina diruşm û navê îsal de jî, xamineyî ragehand ku di warê aborî ji wav re girîn e û rewşa cîhadî bi xwe ve girtiye, jiber ku diravên wan nemaye da ku çekan bikirin û ji Beşar Esed û Hizbullaha Lubnanê û diravê heyvane ya hêzên serkutker ên Sipah û Îtilaatê nikarin dabîn bikin û lewra bi mudîriyeta cîhadî, dixwazin samanê welat xisar bikin daku diravên pirojeyên xwe ên terorîstî û tevdanîkariyên xwe bidest bixin. Di warê çandî de, tundûtîjî û serkut û sanorê zêdetir dikin da ku ji xelkê re bêjin ku, raste wan di hember Rojava de ser tevandine, lê bersiva xelkê Îranê bi gulle û sêdarê didin.

Di diyarîkirina diruşm û navê îsal de jî, xamineyî ragehand ku warê aborî ji wav re girîn e û rewşa cîhadî bi xwe ve girtiyr, jiber ku diravên wan nemaye da ku çekan bikirin û ji Beşar Esed û Hizbullaha Lubnanê û diravê heyvane ya hêzên serkutker ên Sipah û Îtilaatê nikarin dabîn bikin û mlewra biu mudîriyeta cîhad, dixwazin samanê welat xisar bikin daku diravên pirojeyên xwe ên terorîstî û tevdanîkariyên xwe bidest bixin.

Di warê çandî de, tundûtîjî û serkut û sansorê zêdetir dikin da ku ji xelkê re bêjin ku, raste wan di hember Rojava de ser tewandine, lê bersiva xelkê Îranê bi gulle û sêdarê didin.

BDP di hilbijartinên herêmî de, li gorî encamên nefermî li 3 jê bajarên mezin, 11 bajaran, 68 navçeyan û 23 bajarokan bi ser ket

Li gorî encamên nefermî, BDP'ê di van hilbijartinan de 3 bajarên din li bajarên di destê xwe de zêde kir, hejmara şaredariyên xwe derxist 102'an. Li hin navçeyan jî encamên hilbijartinê cihê nîqaşê ne.

BDP'ê li 3 bajarên mezin, 11 bajar, 68 navçe û 23 bajarokan bi ser ket. Rêjeya dengê BDP'ê li gorî hilbijartinên 2009'an li hin bajaran kêm bû, lê li hin bajaran derket asta rekorê.

BDP ku di sala 2009'an de ji sedî 5,21 ê dengan stend, di hilbijartinên herêmî yên 30'ê Adara 20114'an de li gel HDP'ê ev rêje derxist ji sedî 6,36'an. Di nava bajarên ku li şaredariyên BDP'ê zêde bûn Mêrdîn, Agirî û Bedlîs cih digirin. BDP'ê şaredariyên xwe yên Amed, Êlih, Wan, Dêrsim, Sêrt, Colemêrg, Şirnex û Îdir jî parast.

Bajar, navçe û bajarokên BDP'ê qezenc kiriye ev in:

AGIRÎ

Navend, Giyadîn, Bazîd û Tûtgax

ÊLIH

Navend, navçeyên Qûbîn, Kercews û bajarokên Îkîkopru û Balpinar

BEDLÎS

Navend, navçeyên Ovakişla, Norşîn, Xîzan, Moktî û bajarokê Yolalan

AMED

Bajarê Mezin, navçeyên Baglar, Bismil, Çinar, Pîran, Egîl, Erxenî, Hênê, Hezro, Peyas, Karaz, Pasûr, Lice, Farqîn, Sûr û Yenîşehîr

COLEMÊRG

Navend, navçeyên Çelê, Şemzînan û Gever, bajarokên Buyukçîftlîk û Bajerge

ÎDIR

Navend, navçeya Tozan (Tuzluca) û bajarokê Xoşxeber

ELEZÎZ

Navçeya Dep'ê

ERZÎROM

Navçeyên Xinis Karaçoban, Qereyazî û Tekman

QERS

Navçeya Dîgor

SEMSÛR

Bajarokên Bulam û Komur

MÊRDÎN

Bajarê Mezin, navçeyên Artûklû, Kerboran, Dêrik, Qoser, Şemrex, Nisêbîn, Mehsert û Stewr

MERSÎN

Navçeya Akdenîz

MÛŞ

Navçeyên Kop, Milazgirt, Gimgim û bajarokên Esentepe, Rustemgedîk û Ûzgorur

SÊRT

Navend, navçeyên baykan, Dihê û bajarokên Veyselkaranî, Kayabaglar, Gokçebag, Atabagi û Begendîk

RIHA

Hewend, Xelfetî, Pirsûs û Wêranşar

ŞIRNEX

Navend, navçeyên Elkê, Cizîr, Hezex, Silopî û Qilaban, bajarokên Findik, Sirtkoy, Balvegeren, Kûmçati, Başverîmlî û Gorumlu

DÊRSIM

Navend û bajarokê Akpazar

WAN

Bajarê Mezin, navçeyên Mûks, Elbak, Ebex, Şax, Artemêt, Erdîş, Payizava, Rêya Îpekê, Bêgir, Qelqelî û Serav.

Encamên ne fermî yên hilbijartinên herêmî li Tirkiyê

Hewlêr (Rûdaw)- Proseya veqetandin û hejmartina dengên hilbijartinên herêmî li Tirkiyê berdewame heta niha jî ji sedî 97 ji dengan hatine hejmartin, li gorî encaman jî Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) di hilbijartinan de ser ketiye.

Sendûqên hatine vekirin: 190.388-97.87%
Rêjeya dengan: 46.004.203
Dengên pesendkirî: 44.233.730
Rêjeya beşdariyê: 87.26%
Hejmara giştî ya dengderan: 52.718.458

Rêjeya gitşî ya dengên AKP: 45.6%
Rêjeya gitşî ya dengên BDP: 4.0%
Rêjeya gitşî ya dengên HDP: 2.2
Rêjeya gitşî ya dengên CHP: 27.9%
Rêjeya gitşî ya dengên MHP: 15.2%
Aliyên din: 7.3%

Rêjeya dengên BDP li Amedê: 54.68%
Rêjeya dengên BDP li Wanê: 52.18%
Rêjeya dengên BDP li Hekarî: 66.76%
Rêjeya dengên BDP li Şirnaxê: 59.55%
Rêjeya dengên BDP li Sêrtê: 49.4%
Rêjeya dengên BDP li Batmanê: 56.35%
Rêjeya dengên BDP li Bedlîsê: 44.05
Rêjeya dengên BDP li Agirî: 46.1%
Rêjeya dengên BDP li Îdirê: 44.56%
Rêjeya dengên BDP li Dêrsimê: 42.46%

Rêjeya dengên AKP li Rihayê: 61.83%
Rêjeya dengên AKP li Gezî Entabê: 54.57%
Rêjeya dengên AKP li Çewlîkê: 58.04%
Rêjeya dengên MHP li Qerisê: 28.7%
Rêjeya dengên AKP li Elezîzê: 55.83%
Rêjeya dengên AKP li Erzerûmê: 58.81%
Rêjeya dengên AKP li Erzincanê: 54.71%
Rêjeya dengên AKP li Mereşê: 59.16%
Rêjeya dengên AKP li Meletê: 61.54%

Kerîm Qelatî: “Rojên herî xweş ên jiyana min ew roj in ku ez pêşmerge bûm û Dr. Qasimlo hêj sax û silamet bû. Hertim min hîs dikir ku ez taze bûme pêşmerge û tu caran min mandîbûn hîs nedikir”.

H:Rehîm Gergulî

Kerîm Qelatî naskirî bi Kerîm Naylon, kurê Rehîm Qelatî, sala 1962(1341)’an li gundê Qarnê ya ser bi bajarê Nexedê hatiye dinê.

Kerîm Qelatî her di zarokatiya xwe de babê xwe ji dest dide û di temenê 7 saliyê de diçe xwendingehê, lê mixabin tenê piştî heftiyekê bi sedema destengî û hejariyê destan ji xwendinê dikişîne û heya temenê 18 saliyê mijûlî karê cotkarî û şivantiyê dibe.

Lê Kerîm Qelatî bi sedema vê ku ji xwendinê pir hez dike, kariye ku di xwendingeha Şoreşê de heya pola 6 a despêkî bixwîne.

Kerîm Qelatî nasyariya xwe bi PDKÎ re weha tîne ziman: “Ez gellek zarok bûm ku dayka min basa cangorîtî û lehengiya pêşmergan ji min re dikir, lê sala 1978(1357)’an Hacî Ehmedî û Îbrahîm Telac li devera Nexedê li nav gundan digeriyan û basa PDKÎ ji xelkê re dikirin û xelk dikirn endamê partiyê, wî çaxî min bi başî PDKÎ nas kir”.

Kerîm Qelatî herweha tevlîbûna xwe bi PDKÎ weha tîne ziman:“Demsla Payîza sala 1978(1357)’an ez bûm endamê PDKÎ û min peywendiya xwe tevî Sofî Kerîm Mehmûdî damezirand.

Lê piştî kuştara gundê Qarnê û di sala 1979(1358)’an de, min tevî 7 hewlên xwe li gundê Bayîzawê ku wî çaxî baregehên partiyê lê diman, xwe bi partiyê nasand.

Berpirsê baregeha PDKÎ wî çaxî Omer kerîmî bû. Omer Kerîmî pirsyar kir ku kişan ji we xwediyê jin û zaroka ne?

Sê kes xwediyê jin û zarokan bûn, ew sê kes şandin mala xwe û em 5 kes jî bû pêşmerge”.

Kerîm Qelatî roja herî xweş a jiyana pêşmergatiya xwe weha tîne ziman: “Rojên herî xweş ên jiyana min ev roj in ku ez pêşmerge bûm û Dr.Qasimlo hêj sax û silamet bû. Hertim min hîsdikirkuez taze bûme pêşmerge û tu caran min hîs bi mandîtiyê nedikir”.

Di hember de jî Kerîm Qelatî roja herî nexweş a jiyana xwe weha bas dike: “Roja cejna Qurbanê bû, baregehên me li Cawkanê bûn, du pêşmerge hatin û gotin gelo we nezaniye ku teqe ji Dr.Qasimlo hatiye kirin û mixabin birîndar ketiye?

Piştre berpirsyarê baregehê hat û got xwe ngeran nekin û birînên Dr.Qasimlo ne giranin.

Mixabin her êwariya wê rojê xebera şahîdketina Dr.Qasimlo belav bû. Birastî bi qasekê nexweş bû ku min wusa hizir dikir ku duniya li ser serê min xirab bûye”.

Kerîm Qelatî dehreq jiyana xwe ya hevpar dibêje: “Sala 1986(1365)’an min tevî Zara Fetahî keça şehîd Îsma’îl Fetahî jiyana hevpar ava kir û berhema jiyana me jî 2 keç û kurek e”.

Kerîm Qelatî piştî pitir ji 30 sal pêşmergatiyê çavnihêriya xwe li hember PDKÎ weha tîne ziman û herweha hêviyekê jî dixwaze: “ Piştî zêdetir ji 30 salan xebat û pêşmergatiya berdewam, tenê çavnihêriya min ev e ku PDKÎ biser bikeve, eva ji boy min tev tişte, hem madî û hem jî me’newî.

Herweha take hêviya min ev e ku Kurdistan rizgar be û ez cardin vegerim Kurdistanê û bikarim seredana malbatên şrhîdan bikim û bêjim ax çiqas xweş e ku xwîna şehîdên me bi xisarî neçû ye”.

Kerîm Qelatî rû li xelkê Kurdistanê dike û bi vê peyamê dawiyê bi hevpeyvîna xwe tîne: “Peyama min bo xelkê Kurdistanê ev e ku her weke berê PDKÎ bi partiya xwe bizanin û piştevanê partiya xwe bin, seredana malbatên şehîdan bikin û di xweşî û nexweşiyan de tevî wan bin û herweha seredana malbatên girtiyên siyasî bikin, ji ber ku him şehîd û him jî girtiyên siyasê li ser bidestxistina mafên rewa ên gelê Kurd canê xwe jidest dane û di girtîgehên Komara Îslamî de ne”.

Nîşana berxwedan û berdewambûna li ser xebatê di newroza îsal ya Kurdistanê de

N: Kanyaw

Rêûresma cejna newrozê li gund û bajarên Kurdistana Îranê de, di demekê de birêve çû, ku hêzên rejîma Îranê bi ewlehîkirina gund û bajaran hewla têkdana wan rêûresman didan, lê rêûresma cêjna newrozê berevajiyê xwesteka karbidestên rejîma Îranê , di nava gund û herêmên curbicur ên Kurdistana Îranê bi serkevtin ve birêve çû.

Îsal jî xelkê Kurdistanê bi alîkariya rêkxirawên çandî û medenî, wekî salên berê di Kurdistana Îranê de newrozeke neteweyî û geş birêve birin.

Rêûresma cejna neteweyî ya newroz li gund û bajarên Kurdistana Îranê serbarê sepandina rewşeke emniyetî ji aliyê Komara Îslamiya Îranê ve, bi beşdariya berçav ya xelkê Kurdistanê birêve çû, û xelk li hemû gund û bajarên Kurdistana Îranê bi govend û dîlana beşdaran bi bê guhdana bi rewşa ewlehiyê cejna neteweyî ya 2714'an ya Kurdî bi rêve birin.

Xala cihê baldanê ya newroza îsal ji aliyekî ve ew bû ku xelkê Kurdistanê li beşek ji herêman de bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey reqîb" û " Emrojî salî taze ye newroz hatewe", û herwisa bi xwendina sirûdên şoreşgerane û helbest û pexşanan ji aliyê helbestvan û nivîskaran di pesna newrozê de, rêûresmên newrozê bi rêve birin.

Ji aliyekî din ve çalakên medenî di navxwe de jêve ne ku Kurd li Kurdistana Îranê demekê dikare bibe hêza zext û givaşê bo ser Komara Îslamî ku bikare di biyavên curbicur de hêza civakî ya Kurdistanê bilivlivînin. Riya herî serekî jî bo vê meremê alîkarîkirin û xweşkirina rewşê bo lihevnêzîkkirina têkoşerên çiya di gel çalakên medenî li navxwe de ye.

Di vê derheqê de xaleke din ya balkêş rola pozetîv ya medyaya Kurdî ya opozisyon bi taybetî Tîşk TV di warê bi bicoştirkirina rêûresmên newroz û bi taybetî di pêwendî di gel rûmalkirina çalakiyan e.

Herwisa her çend ku beşek ji çalakên medenî û ferhengî li encama serkuta Komara Îslamiya Îranê de, di gel bendîxane, yan hilbijartina jiyana li derveyî welat berbirû bûn, lê îro em dibînin ku xelkê Kurdistanê û bi taybetî ciwanên welat bi hêz û pitansilyeleke zêdetir ve dixwazin ku bi mifahwergirtina ji dîroka xebata pirr ji serweriya ya neteweyî-demokratîk ya gelê Kurd, û ezmûnên xebata medenî tekoşîna xwe germtir bikin.

Di vê derheqê de xala balkêş ew e ku em dibînin ku xelkê Kurdistanê û tekoşerên riya rizgariyê, piştî vê hemû zirara ku li encama tepeseriyê de lê ketiye, serbarê dirêjiya zexta hêzên ewlehiyê, dîsan bi hêza nivşa nû ya ciwanan, û bi derswergirtina ji ezmûna xebata pirr ji şanazî û bi xwîn ya neteweya xwe, û çalakên xwedî ezmûn ên biyavên curbicur, xebata xwe berdewam dikin.

Lewra her ew ber bi pêşveçûna xebata neteweyî li Kurdistanê berhema xebata bi xwîn ya neteweya Kurd e.

Bi xweşî ve rêûresmên cêjna newrozê, xelkê kurdistan û çalakên siyasî û medenî zêdetir ji salên berê li hev nêzîk kiriye. Lewra rêûresmên newroz îsal ew sîgnala ji deshilatdarên rejîmê re şand ku nikare daxwazên rewa ên neteweya Kurd piştguh ve bavêje.

Bêguman xelkê kurdistanê karîne li gorî şiyana xwe çanda yekgirtina cemawerî vegeşînin.

Lewra birêvebirina cejna newrozê bi vî awayî nîşaneya geşeya di biyavê çandî û karê bi kom li Kurdistanê de ye.

Ew deskevta bê guman berhema tekoşîna dehan sale ya xebatkarên riya rizgariyê û şehîdên riya rizgariya Kurdistanê ye, ku xelkê Kurdistanê di wan salên dawiyê de karîne ku serbarê zexta hêzên ewlehiyê ên rejîm cêjna newroz cemawerî û bi kom bi rêve bibin.

Em hêvîdar in ku ew hereketa cemawerî ya xelkê bibe destpêk û pêngavek di warê baştir birêveçûna boneyên neteweyî li Kurdistana rojhelat.

Bîranîna Seydayê Tîrêj

Hewlêr (Rûdaw)- Îro 12 sal bi ser koçkirina helbestvanê navdar ê Kurd Seydayê Tîrêj re derbas dibin. Seydayê Tîrêj di sala 1923'an de li gundê Nicîmê yê girêdayî parêzgeha Hesekê hatiye dinê.

Seydayê Tîrêj navê wî yê rastî Nayifê kurê Heso ye. Gava ew dibe şeş salî, bavê wî mala xwe bar dike û li gundê Sêmitikê bi cih dibe. Tîrêj li wî gundî li cem mela Brahîmê Golî, Quranê û çend pirtûkên olî dixwîne. Wek gellek helbestvanên Kurdan, ew jî di dibistana olî de dest bi xwendin û nivîsandinê dike.

Ew di sala 1937'an de hatiye bajarê Amûdê, û li wê derê dest bi dibistanê kiriye. 5 salan li wê dibistanê xwendiye, lê ji ber mercên aborî xwendina xwe berdewam nekir.

Li Amûdê têkiliyên wî bi helbestvanên mezin Cegerxwîn, Qedrî Can, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza re xurt bûye. Bi bandora wan jî, evîna helbestnivîsandinê di dilê wî de şax daye. Bi wan re xebata nîştimanperwerî kiriye û wek gelek welatperwer û ronakbîrên Kurdan, Seydayê Tîrêj jî di nava civata Xoybûnê de cihê xwe girtiye. Li gel nivîsandina helbest û çîrokan têkoşînek ramyarî jî meşandiye.

Di sala 1952'an de, bi destê hêzên ewlekariya Sûriyê tê girtin, û dîwanek ji helbestên wî yên nebelavbûyî jî tê talankirin. Seydayê Tîrêj ji neçarî demekê dirêj xwe li nav Erebên Cibûran diparêze. Di sala 1973'an de, berê xwe dide bajarê Hesekê û li wir bi cih dibe, heta ku çû ser dilovaniya xwe.

Di roja şemiya 23'yê Adara 2002'an de, di saet 8'ê êvarî li nexweşxaneya Dr. Îsam Bexdê li bajarê Hesekê, helbestvan Seydayê Tîrêj çû ber dilovaniya xwe.

Helbestvanê navdar ê Kurd Cegerxwîn di dîwana xwe ya "Kî me Ez" de li ser Seydayê Tîrêj bi navê wî yê rastî "Nayifê Heso" helbestek nivîsandiye. Cegerxwîn di wê helbesta xwe de wiha dibêje:

Ev xwendin û zanebûn

N ê z î k
dikin serxwebûn

Xortên wek te pir zana

Gerek bêjin; Nezana

Bira destên hev bigrin

Di vê rê de em bimrin..."

Berhemên Seydayê Tîrêj

Berhemên wî yên çapkirî ev in:

Dîwana Xelat, Libnan-Beyrût-1985.

Dîwana Zozan, Libnan-Beyrût-1990.

Dîwana Cûdî, Libnan-Beyrût-1998.

Serpêhatiyên Kurdan (1).

Berhemê wî yên neçapkirî ev in:

Mûlida Kurdmancî.

Dîwanek ji helbestan.

Serpêhatiyên Kurdan(2).

Seydayê Tîrej 3 caran hatiye xelat kirin:

Xelata Roja Helbesta Kurdî li Sûriyê 1995.

Xelata 100 Saliya Rojnamevaniya Kurdî. 1998, Hewlêr.

Xelata Koma Helebce ya Folklora Kurdî li Cizîrê-Hesekê. 2001.

Seyda di helbestên xwe de zor û sitemkariya li ser neteweya Kurd, sedemên bindestiya gel û ji bo rizgariya Kurdistanê pêwîstiya tekoşînek bi yekdest û canbêzariyek bê sînor didît û dibêje:

Ez narevim narevim pêşmergim ez narevim

Wek hîm û tehtê çiyê tu car ji cih nalivim

Bi zarotî diya min şîr daye min bi xwînê

Dunya li min bi yek bî ji ya xwe danakevim.

Gotinên Navdaran

A: Firat Cewerî

Hêvî,nanê belengazan e.

Thales

Hêvî,xewneke ku mirovan hişyar dike.

Aristo

Ger hêvî ji dest biçe,tirs jî diçe.

Milton
Ji ber dêla şerefa min bimire,ez bimirim çêtire.

Addison

Şeref ji bo peyayên birûmet,ji jiyanê jî biqîmettire.

Shakespeare

Du navên şeytên hene:Yek jê şeytan e,yê dinjî derew e.

VictorHugo

Cihê ku şeytantê tê re derbas dibe,jin jî dikarin tê re derbas bibin.

ProsperMêrimê

Azad: Ê
Berfin: Êzing
Azad: A
Berfin: Agir
Azad: Î
Berfin: Îsot
Azad: Q
Berfin: Qijik
Azad: M
Berfin: Masî
Azad: W
Berfin: Wêne
Azad: X
Berfin: Xanî
Azad: Xw
Berfin: Xwê
Azad: Her biji Berfîn.
Berfin: Spas Azad can.

Tîpên Nêzdeng

Ew hevalên ku bersiva rast ya metelokan dane:

1- kavûs Ezîzî ji Danmarkê

2- Zeynelabidîn ji bajarê Wanê

3- Evîn hêja ji Urmiyê

4- Dilovan Duhokî ji Duhkê

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

1 - Tiştek min heye ser mişar, nîkil mikar.
- Şaşik li ser seraye, bang dide, lê ne melaye.
- Sere mişaru, pê xeparu.
Bersiv: Dîkil/Dîk
2 - Ji vêrê heta Mûsil hemî lawkên çav bi kil.
- Ji vêrê heta Mûsil, hemî xatûnên çav bi kil.
- Wit wit, şûnkê dûl qut.
- Dengbêjekî dengzelal e, ji qewmê xwe re neyar e.
- 10 mêr bi rengekî sitrana dibên bi dengekî.
Bersiv: Kew
3- Bager dezî, li palê bezî. (* Ji kewa biçûktire)
Bersiv: Sûsik
4- Li erdê weke gîsk e, li esman weke nîsk e.
Bersiv: Eylo/Ilho
5. - Tişteke ji gezê biçûktire, ji bihostê mezintire, ji befrê sipîtire û ji qîrî reştire.
- Reş e reş e mîna qîrr, spî ye spî ye mîna şîr, diçe diçe mîna mîr.
Bersiv: Qişqil
6- Tiştekî tiştane, li ser kevra xiştane.
Bersiv: Çûçik/çoleke
7 - Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difirit diçite esmanî.
Bersiv: Meqesok

Xwendevanên hêja!

Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi rêya E-maila Agiri2003@gmail.com ji me re bişînin.

AGIRÎ

NavnîŞana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

Çend dîmenên taybet bi rêûresma 10’ê Xakelêwe, roja Şehîdên kurdistanê, Koye- kurdistana başûr